## HEVBERDAN

Hevberdan pêvajoyeke qanûnî ya ji bidawîkirina zewacê ye. Hevberdan li Dakotaya Bakur ji ber sedemên cuda tê ragihandin. Zina, zilma zêde, tenêhiştina bizanîn, îhmalkirina bizanîn, îstîsmar, bikaranîna alkolê yan jî tiryakê, cezagirtin ji ber sûcekî giran yan jî lihevnekirin ji hin sedeman in.

Sedema herî berbelav ya hevberdanê lihevnekirin e. Hewce nake ku dadgeh aliyan biqisûr bibîne, heke biryarê bide ku ji bo zewac berdewam neke sedemên giring hene, ev bes e.

Ji bo ku kesek dikaribe li Dakotaya Bakur doza hevberdanê bike, divê dozdar yan jî kesa/ê doza hevberdanê dike şeş mehan beriya vekirina dozê li Dakotaya Bakur jiyabe. Lê belê, dema ku dozdar li benda maweya şeş mehî disekine, dikare doza hevberdanê bike.

Gava mirov hevberdanê dixwazin, pirsgirêkên hevpar derdikevin holê. Mijarên wekî welayet, serdan, nefeqeya zarokan, sîgortya tenduristiyê, nefeqeya hevjîniyê, parvekirina mal û milkan û parvekirina deynan hin ji van in. Dadgeh di doza hevberdanê de parvekirineke dadperwer yan jî wekhev ya mal û milk û deynan dike. Kesa/ê berdayî dikare paşnavê xwe yê beriya zewacê vegerîne.

Piştî doza hevberdanê dest pê bike, ango bi teblîxkirina ewraqên hevberdanê re her du alî jî nikarin bêyî destûra dadgehê mal û milkan bifiroşin yan jî ji destê xwe derxînin. Divê 30 rojan piştî teblîxkirina ewraqên hevberdanê him her du alî him jî parêzerên wan bên cem hev. Pêwîst e di vê civînê de agahdarkirina giştî, lîsteya mal û milkan û lîsteya deynan bê derxistin. Pêwîst e her du hevjîn jî hin agahiyan parve bikin. Agahiyên karkirinê û mûçeyê, agahiyên danezana bacê û agahiyên teqewîtiyê hin ji van agahiyan in.

North Dakota Century Code Chapter 14-05

Legal Self Help Forms



Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020